# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 947 04-Adar- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني


# Fikir û felsefeya Ocalan digere

Ciwanên Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê bi pirtûkxaneya gerok pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan li navçeya Ranya ya Silêmaniyê belav kirin.

Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê, li ber Zanîngeha Ranya û Baxê Giştî pirtûkên Ocalan bi pirtûkxaneya gerok belav kirin. Endamê Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê Şahîn Sengawî diyar kir ku armanca çalakiya wan, belavkirina fikir û feslefeya Rêber Ocalan e û ew dixwazin van fikr û vê felsefeyê bigihînin xelkê.

***ROJNEWS***



# Pêşangeha Asli Filiz li Parîsê

**Asli Filiz got, "Ez bi giranî li ser babeta jinê kar dikim. Min hewl da ku ez êşên me, şahiyên me bi rengan nîşan bidim. Hêvîdar im ku min karibûye van hestên xwe bigihînim we."**

Tevgera Jinên Kurd li Fransayê, di çarçoveya çalakiyên 8´ê Adarê de pêşangeha Asli Filizê ya bi navê "Destên me li ser navtenga me ne" 1´ê Adarê bi resepsiyonekê li Navenda Civaka Demokratîk a Kurd a li Parîsê de vekir.

Namzetê parlamenteriyê yê Tevgera yên Serînatewînin a Fransayê, endamê meclîsa şaredariya bajarê mezin a Parîsê Danielle Simonnet, Mala Aştiyê ya Parîsê, Tevgera Aştiyê, endama meclîsa şaredariya departmana dehan a Parîsê Elie Joussellin, Mala Jinan a Montreuilê, nûnerên Partiya Komunîst a Fransayê, kedkarên CDK-F, TJK-F û Tev-Çand Parîsê jî di resepsiyonê de amade bûn. Di pêşangehê de berhemên Asli Filizê yên "Şahmaran", "4 Jin 4 Xak", "Motîfên Merşan ên Dest li ser navtengê", "Keçên winda yên Dêrsimê", "Aysel Tugluk-Bîr", "Li Rojava jin", "7 rojên dayika Teybet" cihê xwe digirin.

Asli Filiz di resepsiyonê de got, "Ez bi giranî li ser babeta jinê kar dikim. Min hewl da ku ez êşên me, şahiyên me bi rengan nîşan bidim. Hêvîdar im ku min karîbûye van hestên xwe bigihînim we."

Di resepsiyonê de muzîkjena ciwan Zelal Allak li kemanê xist û Deniz Yavuncu jî li piyanoyê xist. Pêşangeh wê heta 10'ê Adarê vekirî be. Asli Filiz jî wê heta 4 Adarê li cihê pêşangehê be û serdêran pêşwazî bike.

***Ozgûr Polîtîka***



## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Bertek | Derketina li hemberî tişteki, nerazîbûn: Li hemberî kiryarên wî bertek nîşan da. |
| Şênî | Yên li ciyekî ava dijîn: Şêniyên gund cejin pîroz dikirin. |
| Şênber | Tiştên ku mirov dikare destê xwe bide wan û bibîne. Melmûs: Weke kevir, av, dar... |
| Razber | Tiştên nayên girtin û dîtin. Tersê şênber: Weke heskirin, xemgînî... |
| Bîrdozî | Koma fikrên ku di warê siyasî, hiqûqî, zanistî, felsefî û dînî de rê didin ber tevgerên komekê, partiyekê yan rêveberiyekê. Îdeolojî. |
| Guncaw | Tişta bi kêr tê. Mûnasib: |
| Pêman/pêwan | Wesîle: Bi pêmana salvegerê şahiyek hat lidarxistin. |
| Hişmendî | Têgihiştin, zêhniyet: Hişmendiya wî ya derbarê jinan de ne rast e. |
| Vegirtin | Standina erdekî, milkekî bi darê zorê ji kesekî. Dagîrkirin: Welatê me vegirtin. Wateyên wê yên din jî hene. |
| Bişaftin | Helîna hêdî hêdî: Kevaniyê keşk bişaftin û dewê wan berda ser xwarinê. Herwiha bi mecazî tê wateya asîmîlebûn û asîmîlekiriinê jî: Civaka ne azad be tê bişaftin. |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | O | X | ■ | M | E | L | E | T | Î |
| 2 | D | E | H | ■ | W | ■ | L | ■ | C |
| 3 | E | ■ | I | R | ■ | Î | M | H | A |
| 4 | ■ | P | Z | ■ | E | S | A | ■ | D |
| 5 | M | A | R | S | ■ | A | S | A | ■ |
| 6 | A | R | ■ | S | A | L | ■ | D | E |
| 7 | L | A | L | ■ | D | ■ | K | I | N |
| 8 | ■ | D | ■ | K | A | B | A | L | A |
| 9 | N | Î | S | A | N | ■ | L | ■ | M |

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 3 | | | | | | ■ | | | ■ |
| 4 | ■ | | | | ■ | | | ■ | |
| 5 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 6 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 7 | ■ | | | | ■ | | | ■ | |
| 8 | | | ■ | | | ■ | | | ■ |
| 9 | | | | | ■ | | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Navbera du tiştan
2. Baneşaneke gazîkirinê... (Siyabend ...) Destaneke me
3. Ava ku ji ber helîna berfê çêdibe... Yezdanekî misrî
4. Rengek... Tevgera hewayê
5. (… Bedirxan) Balerîneke Kurd
6. Kurtebêja Antîmonê... Pêşgireke lêkerçêker e û wateya berbijoriyê dide... Vexwarina sereke
7. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Alif, xwarina sewalan
8. Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Daçekek... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tinekirin
9. Vexwarineke bi alkol... Encam, netîce

**JOR-JÊR**

1. Hesinê ku li binê piyê hespan dixin... Rêxistina polîsan ya Naziyan... Cureyekî xwînê
2. Îşaret, şop... Tiştên ku tekildarî reşayiyê ne
3. Pênûs
4. Postê gurandî... Birûmet, birêz
5. Xanedana qraliyeta Vîetnamê
6. Bersivan pejirandinê, erê
7. Avahiya mezin a ku hikumdar an jî serokdewlet lê dimînin... Ajela xwedîtêjik
8. Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin... Notayek... Bi rûsî erê
9. Dengdêrên "pêça"yê... Dua, niyaz

## Nisrîn Ebdullah: Emê parêzvanên mîrateya Clara Zetkîn û Rosa Luxemburg bin

*Fermandara YPJ`ê got, emê parêzvanên mîrateya Clara Zetkîn û Rosa Luxemburg bin, lê em têkoşîna xwe mehkûmî rojekê tenê nakin. Herwisa divê jinên cîhanê rêxistineke hevgirtî, biarmanc û li ser rêgezên têkoşîna zanistî ya hevbeş ava bikin. R-5*




# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 947 06-Adar- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## Hêmana herî mayînde ya demokratîkbûnê azadiya jinê ye



*Jina bi kêmayî tê dîtin, bingehê wê derewa herî rajêr ya mêrê windakirî ye û hêmana herî mayînde û berfireh ya demokratîkbûnê, dîsa azadiya jinê ye. R-4*

# ŞOREŞA ROJAVA 365 ROJ KIRIN 8'Ê ADARÊ



# ‘Piştî şoreşê tevayiya rojên salê weke 8`ê Adarê tên dîtin’

Jinên Kurd, Ereb û Suryan diyar kirin ku bi pêşengiya şoreşa Rojava 8’ê Adarê gihîşt wateya xwe û gotin, Rêber Apo bûye rêberê jinên cîhanê, lewra jinan hêza têkoşîna azadiyê jê girtiye.

**Darîn Silê-Qamişlo**

Bi hatina Adarê re her tişt zindî dibe. Meha Adarê hem ji bo gelê Kurd meha berxwedan û qehremaniyê ye, hem ji bo jinan meha têkoşînê ye. 8`ê Adarê bi têkoşîn û berxwedana xwe, xwe bi cîhanê dide naskirin û mafê xwe bi dest dixe.
Weke ku tê zanîn 8`ê Adarê bi Roja Jinên Kedkar Yên Cîhanê tê naskirin. Li New Yorkê ji bo bidestxistina mafê xwe 129 jinan berxwedaneke dîrokî kir. Li Kurdistanê jî bi derketina tevgera jinên berxwedêr re û bi saya ked, lehengî û wêrekiya wan, bi taybetî yên mîna Sakîne Cansiz, Bêrîtan Zîlan û Arînan, herwiha yên şehîd bûyîn, dîroka jinê hat nivîsandin.
Derbarê roja 8`ê Adarê `Roja Cîhanî Ya Jinan` jinên Kurd, Ereb û Suryan nêrînên xwe ji me anîn ziman. Herwiha behsa girîngiya vê rojê kirin û bal kişandina ser guhertina di vê rojê de berî şoreşê û piştî wê.



Jina Suryan ya bi navê Reşa Yûhena Şemûn diyar kir ku 8`ê Adarê girîngiya jinê di tevayiya aliyên jiyanê de û di civakê de diyar dike û wiha got: “Jin ji kevin ve girîngiya wê heye, lê piştî şoreşa Rojava, jinên herêmê di nava civakê de pirtir xwe dan naskirin. Em jinên bakur û rojhilatê Sûriyê bi wêje, zanîn, statûya bilind û zanista xwe tên naskirin û bala jinên cîhanê dikişînin. Ne di milê zanistê tenê, di milê leşkerî de jî jinan li Rojava xwe isbat kir.”
Reşa bal kişand ser rola jinan li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û axaftina xwe wiha domand: “Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê roleke girîng di berxwedana azadiyê de lîstin û lehengiyên dîrokî bi dest xistine. Bi salan li ber xwe dan û ew qalibê ku bi ser wan de hatibû sepandin ji holê rakirin. Jinan di tevayiya warên jiyanê de kedeke pir mezin daye û mohra xwe li şoreşê dane.”

**`Em deyndarên Rêber Apo ne û rêberê me jinan e`**

Reşa Yûhena Şemûn gotina xwe wiha bi dawî kir: “Bi saya Rêber Apo, jin îro di qadên şer de têkoşînê dikin û di her qada jiyanê de jî kedê dide. Hevalê jinê yê yekê Rêber



Apo ye. Rêber Ocalan jin ji taritiyê derxistin, deriyê ronayiyê ji wan re vekir, ji koletiyê rizgar kirin û qada azadiyê ji wan re vekir. Ji bo wê em her tim dibêjin em deyndarên Rêberê xwe ne û heta rêbertî azad nebe jin jî azad nabin.”
Jina Ereb ya bi navê Belqîs Hemendî jî, behsa girîngiya Roja Cîhanî ya Jinan kir û wiha dirêjî da axaftina xwe: “8`ê Adarê weke rojeke dîrokî û bingehî tê dîtin. Bi taybetî li bakur û rojhilatê Sûriyê, jin bi çavekî mezin meyzeyî vê rojê dikin û hêz û baweriya xwe tê de dibînin. Hêz û berxwedana jinên Sûriyê hiştin ku gelek jin tevlî şoreşê bibin û baweriya wan bi wan were.”

**`Piştî şoreşê tevayiya rojên salê weke 8`ê Adarê tên dîtin`**

Belqîs diyar kir ku berî şoreşa Rojava were lidarxistin jinan zêde wate nedida 8`ê Adarê û got, piştî ku şoreş hat lidarxistin û jinan xwe



tê de bi rêxistin kir êdî ev roj ne weke rojên din tê dîtin. Çimkî jinê di vê rojê de gelek kar û xebatên têkîldarî jin û civakê da meşandin. Ji wê demê ve jinên bakur û rojhilatê Sûriyê berxwedana xwe didomînin û li ber xwe didin. Ne tenê roja 8`ê Adarê tevayiya rojên di salê de weke 8`ê adarê dibînin. Ji bo wê jî berxwedana û çalakiyên jinan bê navber dewam dikin.
Belqîs Hemendî di dawiya axaftina xwe de got, Rêber Apo ku bûye serokê jinan, hişt ku jin bi ser bikeve ji bo wê jî dibêje, `azadiya min bi azadiya jinê re ye`. Ji bo wê, wek jin çi jime bê xwestin emê bikin. Dema jin serkeftî be zarokên wê civakê jî wê biserkeftî bin, ji ber ku paşroja civakê bi jinê ve girêdayî ye. Ji bo ku jin asta têkoşînê li hemberî zihniyeta zilam ya serdest mezin bike, xebata xwe dewam dike.

**`Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji jinên cîhanê re bûne pêşeng`**

Jina Kurd ya bi navê Evîn Qafûr ku Cîgira Hevseroka Desteya jinê ya herêma Cizîrê ye jî, 8`ê Adarê di serî de li Rêber Apo, tevayiya şehîdên Azadiyê û li jinên cîhanê pîroz kir û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji cîhanê re isbat kirin ku li gorî fikrên xwe yên azad dixebtin û banga mafên xwe dikin. Herwiha edalet û wekhevî di nava civakê de pêk tînin. Ji bo parastina ewlehiya herêmê jî şer dikin û li tevahî cîhanê bûne pêşengê têkoşîna azadiyê. Jinên cîhanê, jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji xwe re weke mînak dibînin.”
Evîn bîr xist ku berî şoreşê ji ber desthiladariya rejima Sûrî, ti kesê nikariya vê rojê weke roja jinan pêroz bike û got, piştî şoreşê bi ewlehî jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, dikarin bi cil û bergên xwe yên çandî çalakiyên fistîval û şahiyan, ji bo vê rojê li dar bixin û 8`ê Adarê pîroz bikin.
Cîgira Hevseroka Desteya jinê ya herêma Cizîrê Evîn Qafûr di dawiyê de bang li tevayî jinên bakur û rojhilatê Sûriyê kir ku asta tekoşîna xwe xurtir bikin. Herwiha got, armanca berxwedanê yeke, mil bi mil emê bigihîjin azadiyê.

# Rosa Luxemburg û Clara Zetkîn

**Ji ber ku vîna jinê tevlî têkoşîna sosyalîzmê nekirin, bû sedem ku têkoşîna jînan jinûve were nirxandin.**

Di sala 1918’an de bi tevlîbûna 1200 delegeyên jin yên gundî û karker konferanseke jinan tê lidarxistin. Piştî vê konferansê yekem rêxistina xweser ya jinê tê birêxistinkirin û jin li jêr vê saziyê birêxistin dibin. Stalîn di sala 1929’an de bi vegotina “Pêwîst e dewlet pêdiviyên jinê pêşwazî bike” vê rêxistinbûna xweser dide girtin. Neçar dikin ku jinên şoreşê, bibin jinên malên xwe.
Ji ber ku vîna jinê tevlî têkoşîna sosyalîzmê nekirin, bû sedem ku têkoşîna jinan jinûve were nirxandin. Yên ji navên herî lipêş ên têkoşîna sosyalîzmê û nûnerên Marksîzmê yên jin Rosa Luxemburg û Clara Zetkîn bûn, lê nekarîn sînorên desthilatdariyê derbas bikin. Rosa û Clara pê bawer bûn ku azadiya jinê bi serxwebûna aborî mumkin dibe, lewma jî bawer dikirin ku heke jin tevlî hilberînê bibe, wê azadiyê bidest bixîne. Dihizirîn ku ger jin bi proleterya re tev bigerin û tevlî têkoşînê bibin wê ev têkoşîn, azadiya jinê jî bîne. Sekna Rosa û Clara di nava rêxistinê de bi awayeke birêgez û radîkal bûn.

Rosa Lûxembûrg bi mebesta aliyên ku rexne dike derbas bike, di 1’ê Çileya sala 1916’an li beramberî polîtîkayên dewletê, bi navê Yekîtiya Spartakûs grûbekê birêxistin dike. Ji ber dijbertiya grûbê li beramberî polîtîkayên dewletê, Rosa bi girtîgehê tê cezakirin. Di nav van salan de jî meqale û nivîsan dinivîse. Di salên girtîgehê de nivîsên li ser şoreşa Rûsyayê û rexneyên ku li beramberî Bolşevîkan pêş dixîne balkêş in. Rosa di refên têkoşîna xwe de bi zilaman re têkoşîneke dijwar dimeşîne. Rosa bi asîbûn û serhişkbûna xwe ve li gor dema xwe jineke nejirêzê ye, di derdora xwe de hem heyrantî hem jî acizî ava dike. Rosa Lûkxembûrg dema ji girtîgehê derdikeve xebatên xwe berdewam dike û bi hevalên xwe re Partiya Komînîstên Elman ava dike. Ji ber raman û nivîsên xwe pir caran tê girtin, di sala 1919’an 16’ê Çile ji hêla leşkerên împaratoriyê ve heya dimire tê lêdan û paşê jî wê diavêjin çem. Rosa ji bo bibe jineke azad û birûmet ticar ji rastiyên xwe paşvenegeriya û ji mirinê netirsî. Rosa Lûxembûrg bi jiyan û berxwedana xwe mirin binxist.

**Biryara ku 8’ê Adarê Roja Jinên Cîhanê were pîrojkirin**

Clara Zetkîn jî di 5’ê Tîrmeha 1857’an li Saksonyayê tê cîhanê. Bi Rosa Lûxembûrg re di nav netewa Elman de bi proleterya Rûs re di nava piştgîriyê de ye. Dema vê têkoşînê dimeşîne jî hewl dide ku pirsgirêka azadiya jinê jî bike rojev. Sernivîsa metna axaftina kongreya rizgariya enternasyonala duyemîn di sala 1889’an li Parîsê di derbarê rizgariya jinê de amade dike. Clara Zetkîna 32 salî, bi awayeke xwebawer û bi zimaneke rewan yekemîn axaftina xwe dike û di têkoşîna çînê de nûnertiya doza keç û jinan dike. Clara di vê axaftina xwe ya bi bandor de van xalan tîne zimên: “Pêwîst e sosyalîst bizanibin ku, di roja îro de di pêşketina aborî de karkirina jinan zerûrî ye. Sosyalîst beriya hertiştî divê bizanibin ku berbendiya (bağımlılık) aborî û serbixwebûn, bi koletî û azadiya civakî re pêwendîdar e. Yên ku rizgariya her tişta di sûretê mirov de ji xwe re kirine durûşme, nikarin nîvê zayenda mirov mehkûmê koletiya civakî, siyasî û berbendiya aborî bikin. Çawa ku karker bi destê kapîtalîstan kirine jêr nîr, jin jî li jêr nîrê zilam de hiştine û heya jin negihîje azadiya aborî wê wiha jî bimîne. Şertê sereke ji bo serxwebûna aborî ya jinan karkirin e.”
Çawa ku ji van axaftinên Clara jî fêm dibe, wê bawer dikir ku azadiya jinê jî wek azadiya tevahiya mirovahiyê bi rizgarbûna kedê ji nîrê sermayeyê mumkin dibe. Ew pê fikirîbû ku tenê di civaka sosyalîst de jin jî wek karkeran wê bibe xwedî maf. Bi vê axaftina Clara Zetkîn yekem car di enternasyonala duyemîn de mijara jin û sosyalîzmê dikeve rojevê. Di vê enternasyonalê de biryar tê girtin



ku 8’ê Adarê Roja Jinên Cîhanê were pîrozkirin. Di sala 1907’an de bi kombûyîna 59 jinên ji 15 welatan di yekemîn kongreya navnetewî ya jinên sosyalîst de roleke bi bandor dileyîzin. Di wê rûniştinê de biryar tê girtin ku hemû rêxistinên jinan ên sosyalîst bibin yek. Ruxmî ku Clara femînîst bû lê dijberî dike ku bi jinên burjûva re yekbûn çêbibe. Clara Zetkîn di bizava jinên Elman de li beramberî ên nerm (ılımlı) têkoşîneke pir mezin dide meşandin. Bi Helene Stocker re ku Komeleya Parastina Dayîkan saz dike dibe heval. Telebên Helene Stoker ên wek ‘ji jinên ku beriya zewacê jî dibin dayîk re belavkirina dermanên parastina bihemlbûnê û qanûnîbûna mafê kurtajê’ destek dike. Herçend bizavên jinan ev helwest mehkûm kirin jî, hevaltî û helwesta van her du jinan heya ku Clara Zetkîn dimire, dewam dike. Di vê navberê de Clara Zetkîn wek sekretera giştî ya rêxistina navnetewî ya jinê tê hilbijartin û di sendîkabûyîna jinê de jî roleke çalek digre ser xwe. Di sala 1908’an de ji ber ku ji berjewendiya çîna proleter bêtir pêşî dide berjewendiya jinê, erka wê ya di nav SPD’ê de tê sekinandin. Clara pir caran dide diyarkirin ku ji bo wê wateya jiyanê şerkirin e û ji bo ku bi awayeke birûmet bijî qet dest ji têkoşînê bernade. Clara Zetkîn keça mamosteyeke gund e, di temenê zarokînî de bi pirtûkên ku dixwîne, di rêya nirxên ku pê bawer dike berçavgirtina mirinê fêr dibe û jiyana xwe li ser vê xetê dide diyarkirin. Heya sala 1933’an ku dîroka mirina wê ye, heya dawî parastina tiştên ku pê bawere ji xwe re dike rêgez.

Rosa û Clara ji nasnameya zayendî pirtir, bi têgihîştina çînê têkoşîn meşandin. Lêbelê li gorî dema xwe tişta ku bi navê têkoşîna jinê jî kirin, ne di wê astê de ye ku piçûk bê dîtin.

**Çavkanî:Pirtûka Divê Jin Çawa Bijî?**



# Mihrîcana Huner û Wêjeya Jinê dergûşa jinên afirîner e

Jinên nivîskar û hunermed ji bo pêşandana çanda jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, her sal bi rengê jina azad Mihrîcana Huner û Wêjeya Jinê li dar dixin. Di mihrîcanê de rola jinan ya di parastina û pêşxistina çanda civakê de tê dîtin.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Ji bo xurtkirin û hevgirtina jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, di Mihrîcana Huner û Wêjeya jinê de, her yek li gorî çand û hunera civaka xwe tevlî mihrîcanê dibe. Ev jî derfetê dide tevayiya gelên herêmê ku çanda hev ji nêz ve nas bikin. Herwiha mihrîcan ji bo teşwîqkirina afirîneran, dibe ronahî. Eger çand û hunera civakê winda bibe, civak jî winda dibe. Ji bo wê, yên ku bi tîkoşîna xwe civakê diparêzin, jin in. Berî Şorşa Rojava ji ber desthiladariya rejima Sûriyê, çanda gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî gelê Kurd ber bi tinebûnê ve diçû. Şoreşa Rojava bi pêşengiya jinan bi taybetî jinên Kurd, ziman, çand û hunera gel hat pêşxistin û parastin. Jinên herêmê ji tevayiya pêkhateyan, di qada siyasî, leşkerî, civakî û çandî de ji tevayiya cîhanê re nîşan dan ku ti kes nikare li hemberî îradeya wan bisekine. Herwiha jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi lidarxistina Mihrîcana Huner û Wêjeya Jinê, ev nîşan da.

**‘Jin huner û çanda civaka xwe temsîl dike û ji qirkirinê jî diparêze’**

Di mihrîcanê de jinan gelek çalakî li dar xistin û tê de gelek tîmên hunerî beşdarî pêşkêşkirina dîlanên folklorî bûn. Di nava wan de Koma Yursosa ya Suryanî, Koma Şehîda Lorîn û Koma Ronahî Bawer hebûn. Ji bilî beşa govendê, helbest û çîrokan yên bi sê zimanan (Suryanî, Erebî û Kurdî) hatin pêşkêşkirin. Her yekê ji wan rengê çanda xwe nîşan da; xemla xwe li mihrîcanê zêde kir. Herwiha di mihrîcanê de beşdaran, hunerên destan, folklora kevneşopî û cilûbergên gelên herêmê vedibêjin pêşkêş kirin. Di mihrîcanê de gelek tabloyên ku reng û folklora jinan radixin ber çavan hatin nîşandan.

**‘Mihrîcan ji bo jinên afirîner derfet e’**

Tevî şert û mercên dijwar yên ku gel tê re derbas dibe û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, jin bi berxwedan û vîna xwe ya azad li hemberî şert û mercan li ber xwe dide. Tevî encamên ku rastî wê hatine jî, lê dikarîbû bi çand û hunera xwe beşdarî mihrîcanê bibe
Rojnameya me li ser şert û mercên mihrîcanê bi hin beşdaran re hevpeyvîn çêkir. Yek ji wan keça bi navê Me`iab Salih ya 20 salî ya Ereb e. Li ser beşdarbûna xwe ya mihrîcanê wiha ji me re axivî: “Ev cara yekê ye ku ez bi karê xwe yê



destan tevlî Mihrîcana Hunera û Wêjeya Jinê dibim. Ev mihrîcan ji bo jinên afirîner derfet e. Jin bi karê xwe yê destan bi helbest û çîrokên xwe, bi deng û govednên xwe, bi wênesazî û şanoyan ji cîhanê tevê re nîşan dide ku ne ji bo karê malê tenê hatiye cîhanê. Jin sal bi sal di vê mîhrîcanê de, bi rengê jina azad û bedew çanda civaka xwe diparêze û pêş dixe.”



Di heman çarçoveyê de Rîm Hesen ya şanogera Koma Darsî ya bajarê Hesekê li ser lîstika xwe ya di şanoya zewicandina piçûkan de wiha got: “Tevî zehmetiyên ku jin rûbirû tibin,





îradeya wê li hemberî hişmendiya mêr ya desthilatdar têdikoşe û her tim di karê xwe de serkefti ye. Em vê yekê di pêşkêşkirina karê jinan yê di mihrîcanê de dibînin. Ji bilî ku mihrîcan ji bo pêşxistina jinan derfet e, herwiha ew bi şanoyên xwe hişmendiyeke baş di nava civakê de ava dike.”
Wênesaz Solîn Osê jî diyar kir ku gelek cudayî di navbera mihrîcana îsal û sala çûyî de hene. Solîn axaftina xwe wiha domand: “Ev sala duduyan e ez tevlî mihrîcanê dibim. Îsal tevlîbûna jinan ya ji tevayiya bajaran, bala min kişand. Ev tê wateya ku êdî jin gihîştiye wê



baweriyê ku ew çanda civaka xwe neparêze, wê dijmin civaka wê winda bike. Bi vî ruhê berxwedanê, jinên me





bi karê xwe yê destan û dengê xwe yê awaz û cilên xwe yên pir xweşik, tevlî mihrîcanê bûn.”
Di dawiyê de Solîn Osê diyar kir ku ew bi du tabloyan beşdarî mihrîcanê bûye. Wênesaziyeke wê behsa jinên niha li kêlaka yên berê bike. Tabloya din jî wêneyê Mihemed Seîd Axa yê ku di sînemeya Amûdê de dema zarok ji agir parastin, şehîd bûyî ye.

**Belavakirina xelatan**



Mihrîcana Huner û Wêjeya Jinê bi belavkirina xelatan bi dawî bû. Di beşa wêjeyî û hunerî de ji bo 15 serketiyên mihrîcanê mertalên pesindayînê û miqdarek pere hatin dayîn.
Di beşa çîrok û helbestên kurdî de
Di asta yekê de Fecîna Kurd, asta duduyan Kewser Hico, asta sisiyan Mîdiya Berekat.
Helbestvan Anahîta Sîno
Di beşa çîrok û helbestên erebî de;
Asta yekê; Heceb, asta duduyan Selma Şiro, asta sisiyan Neciwa Xelef û Sema Îsa
Helbestvan; asta yekê û duduyan Heceb, asta sisiyan; Neciwa Xelef û Sema Îsa
Gotar asta yekê: Fatima Ehmed ji Helebê
Beşa wênesaziyê;
Asta yekê Hêvîn Elî, asta duduyan Zekai Selamê, asta sisiyan Mîdiya Efranî
Xelatgira asta yekê ya wênesaziyê Hêvîn Elî wiha got: “Ev cara pêncan e ez tevlî Mihrîcana Huner û Wêjeya Jinê dibim. Her sal dema ez tabloyên hevalê xwe dibînim, heskirina min ji karê min re pirtir dibe. Min ji berxwedan û rûkeniya jinên beşdarî mihrîcanê bûyîn pir moral girt.”

# Jinên ciwan bi tabloyên xwe çanda kurdî diparêzin

**Jinên Kurd yên Rojava ji bo parastina nasnameya Kurdî û mîrateya wê ya kevnar bi her awayî têdikoşin. Hinek bi rêya rîş û rengan li dijî qirkirina çandî tê dikoşin.**

Bi destpêkirina Şoreşa 19’ê Tîrmehê li Rojava, jinan di warê siyasî, leşkerî, civakî û çandî de hebûna xwe hîn zêdetir îspat kirin, di pêşxistina şoreş û civakê de xwedî roleke pêşeng bûn. hin ji wan ji bo parastina axa xwe ji êrişên dagirkeriyê çek hilgirtin, hinekan jî ji bo parastina nasnameya gelê xwe ji qirkirinê û misogerkirina mafên xwe tevlî qada siyasî bûn, hin ji wan jî ji bo parastina çanda kurdî ji qirkirinê rîş û reng bikar anîn.
19 jinên ciwan ji bajarê Kobanê bi xêzkirina wêneyan û vekirina pêşangehan nasname û çanda kurdî diparêzin û peyama xwe dighînin civakê.
Her sê jinên ciwan bi wêneyên xwe beşdarî Pêşangeha Sêyemîn a Şêwekariyê ya li Kobanê bûn û bi wêneyên xwe name didan cîhanê.

**‘ Wênesazî zimanekî duduyan e ‘**

Jina ciwan a bi navê Îlham Îsa got ev cara sêyemîn e ku beşdarî pêşangeha şêwekariyê dibe.
Îlham Îsa der barê tabloyên xwe de destnîşan kir ku ew bi 5 tabloyên cuda beşdar bûye. Yek ji wan tabloyan şerê Kobanê û xemgîniya zarokên ku dê û bavên wan şehîd bûne û tabloyek jî mîrata kevnar a kurdî nîşan dide.
Îlham Îsa bang li hemû jinên ciwan ên hezkiriyên wênesaziyê kir ku xwe bi pêş bixin û serkeftinê bi dest bixin, her wiha bang li hemû aliyan kir ku piştigiriyê bidin behreyên ciwanan.
Jina ciwan a bi navê Emîra Nebî got ew bi 4 tabloyên ku folklora kurdî û bedewiya xwezayê nîşan dide beşdarî pêşangehê bû.
Di tabloyeke Emîra Nebî de rola jinan di şoreşa Rojava de bi taybet berxwedana şervanên YPJ’ê nîşan dide.
Emîra Nebî di vê çarçoveyê de got YPJ’ê şerê dijmin kiriye û li dijî êrişên dagirkeriyê axa xwe parastiye. Her wiha îşaret pê kir ku jinên ciwan ên wênesaz bi rîş û hunera xwe û ji bo parastina çand û şaristaniya xwe li hemberî dijmin tê dikoşin.


**Tabloyan diyarî şehîdên Pêngava Gurzê Gelan dike**

Nesrîn Mihemed jî diyar kir ew bi beşdarbûna Pêşangeha Sêyemîn a Şêwekariyê kêfxweş e û hêviya serkeftinê ji hevalên xwe re xwest. Her wiha bang li hemû jinên ciwan kir kir ku behreyên xwe derxînin û pêş bixin.
Nesrîn Mihemed diyar kir ku ew tabloyên xwe diyarî giyanên şehîdên Pêngava Gurzê Gelan dike.
Nesrîn Mihemed bêdengiya navneteweyî ya li hember sûcên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kir û got yek ji tabloya wê xemgîniya zarokekî biçûk li ser mirina çûkekê ye û got: “Heger cîhan li ser mirina mirovan xemgîn bibe sûc nedihatin kirin.”
26’ê Sibatê bi beşdarbûna 19 jinên ciwan ên ji Kobanê û bi çavdêriya şêwekar Mihemed Şahîn bi diruşma “Rengên keskesora Meştenûr sirûda azadiyê dixemilîne” Pêşangeha Şêwekariyê ya Sêyemîn hate vekirin. Pêşangeh 3 rojan dewam kir, di pêşangehê de 70 wêne hatin pêşandan.
*ANHA*









# Dibistana Colan piştgiriya xwendekarên xwe dike û girîngiyê dide mewhîbeyên wan

**Li dibistana Colan ya seretayî ya li bajarê Qamişlo, gelek şagirtên xwedîmewhîbeyên cuda hene; weke nivîsa çîrokan, xêzkirina wêneyan, dengbêjî û şanoyê. Ji bo xwedîderketina li van mewhîbeyan rêveberî û mamosteyên dibistanê bi xwendekaran re dibin alîkar.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Ji bo xwedîderketina li xwendekarên xwedîmewhîbe perwerdeya dibistanê pir girîng e. Perwerde dihêle ku xwendekar li mewhîbeya xwe xwedî derkevin û asta pêşxistinê li gel wan zêde dike. Li Dibistana Colan ya li taxa Hilêliyê jî, ji bo bilindkirina moralê xwendekarên xwedîmewhîbe rêveberiya dibistanê çar mamosteyên jin û mêr diyar kirin da li xwendekaran xwedî derkevin, herwiha mewhîbeyên wan pêş bixin û wan hê zêdetir teşwîqî mewhîbeyê bikin.
Derbarê mijarê de rêveberiya dibistanê, mamoste û xwendekarên wê, nêrînên xwe ji me re anîn ziman. Herwiha rêveberê dibistanê got, me xwest alîkariya xwendekaran bikin, da ku bizanin girîngiyê bidin mewhîbeya xwe û paşguh nekin.

**`Ji bo mewhîbeya zarokan biencam bibe, pêwîstî bi perwerde û alîkariyê heye`**



Mamosteya bi navê Cîhan Osê ku perwerdeyê dide xwendekarên refa sisiyan û li aliyekî din jî xwendekarên jêhatî fêrî xêzkirina wêneyan dike wiha got: "Xwendekarên di milê xêzkirina wêneyan de jêhatî û heskirina wan di milê xêzkirina de heye, ez bi wan re dibim alîkar. Dema bixwazin wêneyekê xêz bikin, destpêkê ez gavên xêzkirinê pêşkêşî wan dikim, piştre her xwendekar li gorî asta xwe wêne xêz dike. Asta xwendekaran di milê xêzkirinê de pir baş e. Rast e mewhîbeyên wan hebûn, lê nizanîbûn ka çawa vê mewhîbeyê derxin. Ji bo wê jî dema ez bi wan re dibim alîkar hêz û îradeya wan xurttir dibe. Mewhîbe ji ber xwe ve dernakeve, divê piştgirî hebe da



ku mirov bikare vê mewhîbeyê derxe û pêş bixe. Niha asta xwendekaran ji destpêkê baştir e. Çimkî rojbiroj mewhîbeya wan xurttir dibe û heskirina wê di dilê wan de mezintir dibe."
Cîhan da zanîn ku bi pênûsên rengîn



wêneyên pir xweşik û biwate tên xêzkirin û axaftina xwe wiha domand: "Di xêzkirina wêneyan de em pênûsên tep û yên avî jî bi kar tînin. Wêneyên ku xwendekar xêz dikin pir xweşik in. Hin çaran mirov dibêje kesekî pispor xêz kiriye, ne xwendekarekî piçûk. Ev cihê kêfxweşiyê ye, herwiha xwendekar keda xwe di wêneyê de dibîne."
Mamosteya Mûzîkê Xunav Xelef jî diyar kir ku, mewhîbeya Mûzîkê di nava xwendekaran de girîngiya wê pir heye û axaftina xwe wiha domand: "Jimareke baş ji xwendekaran, ji dengbêjî û şanoyê hes dikin. Hin xwendekar dengê wan pir xweş e. Ez wan fêrî asta deng û rêzmanên girêdayî mûzîkê dikim. Stranên ku dibêjin tev kurmancî ne, piraniya wan yên hunermend û helbestvanên me yên Kurd in. Gelek caran stiranên Mihemed Şêxo jî tên gotin."

**`Ez bi alîkariya mamosteyan pir kêfxweş im`**

Xwendekara bi navê Darîn Nîhad Osman ya dehsalî ku di refa 5`an de dixwîne wiha axivî: "Ez pir ji şanoyê hes dikim. Ez û hevalên xwe bi hev re naveroka şanoyê dinivîsin. Piraniya şanoyên me li ser dê



û bav, paqijî, girîngiya dibistanê û li ser hevaltiyê ne."
Darîn got, li malê dayîka min, li dibistanê jî mamoste û hevalên min bi min re dibin alîkar. Ez li dibistana Colan pir kêfxweş im. Çimkî mamoste û rêveberiya dibistanê li me baldar in û giringiyê didin mewhîbeyên me. Hêvî dikim di dema pêş de em tevlî tevayiya çalakiyên hunerî bibin, herwiha pêşbirk di navbera me û xwendekarên dibistanên din de çêbin.

**`Armanc xurtkirin û pêşxistina mewhîbeyên xwendekaran e`**

Derbarê piştgiriya mewhîbeyên xwendekaran de, rêvberê dibistana Colan Ferhan Elî jî teqez kir ku di destpêka her salê de rewşa xwendekaran dişopînin û xwendekarên ku mewhîbeyên wan hene wan hildibijêrin, da ku bi wan re bibin alîkar û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji bilî perwerdeya dibistanê, em hefteyê du rojan xwendekarên xwedîmewhîbe perwerde dikin û piştgiriya mewhîbeyên wan dikin. Li dibistana me piraniya mewhîbeyan, xêzkirina wêneyan e."
Ferhan diyar kir ku xwendekarên ji xwendina pirtûkan jî hes dikin em hin caran wan dibin Bexçeyê Xwendinê, da ku li wir saetên xweş bi xwendina pirtûkan derbas bikin û çanda xwendinê li gel wan pêş bikeve.

**'Divê malbat li zarokên xwe xwedî derkevin û girîngiyê bidin paşroja wan'**

Rêveberê dibistana Colan, Ferhan Elî bal kişand ser zêdebûna mewhîbeyên li dibistanê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Vê salê jimara mewhîbeyan, ji sala çûyî zêdetir bûye. Lewra di vê salê de me giringî pirtir da mewhîbeyan û me hin saetên ji bo berwerdeya xurtkirina mewhîbeyan diyar kirin. Wek rêveberê dibistana Colan, ez hêvî dikim ku tevayiya dibistanên heyî piştgiriyê bidin xwendekarên xwe yên xwedîmewhîbe û jêhatî, da ku em di paşrojê de nifşekî xwedîhêz û jixwebawer bigihînin. Banga min ji malbatan re jî ew e ku li xwendina zarokên xwe xwedî derkevin û girîngiyê bidin paşroja wan."

# Komîteya Çandiniyê tevî zehemtiyan alîkariya cotkaran dike

**Hevserokê Komîteya Çandinî û Avdanê ya Meclisa Sivîl ya Dêrazorê Enes El-Hesanî diyar kir ku komîteyê zêdetirî hezar û 500 tonî semad li cotkaran belav kir û sotemenî li xwediyên bîrên tirwazî jî belav kir.**

Çandinî ji girîngtirîn stûnên aboriya civakî ya Dêrazorê ye. Desteya Aborî û Çandiniyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêwîstiyan ji cotkaran re peyda dike da ku çandiniyê li herêmê geş bike. Cotkaraên herêmên gundewarên rojavayê ji kêmbûna ava çemê Firatê û kêmbûna barana îsal bi fikar in ku di mewsimê zivistanî de xisarê bibînin.
Li gundewarên rojavayê Dêrazorê zeviyên çandiniyê bi du awayan tê navenda. Beşek ji ava çemê Firatê û beşek din bi rêya



bîrên tirwazî tên avdan. Desteya Aborî û Çandiniyê sotemeniyê dide cotkaranê xwedî bîrên tirwazî.
Di vê derbarê de Hevserokê Komîteya Çandinî û Avdanê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê Enes El-Hesanî got: "Ji destpêka mewsima çandiniyê ve me dest bi dayîna ruxsetên çandiniyê ji cotkaran re kir da ku desteka pêwîst ji bo çandiniyê weke semad û sotemeniyê werbigirin."
Li tevahî Dêrazorê nêzî 20 hezar û 273 ruxset hatin dayîn. Ji wan 13 hezar ji bo bîrên tirwazî û koperatîfên çandiniyê ye, her wiha zêdetirî 7 hezar ruxset ji bo bîrên tirwazî ye.
El-Hesanî di axaftina xwe de wiha anî ziman: "Me dest da ku ji sedî 78 ji rûbera çandiniyê ji bo mewsimê zivistanê. Me ji sedî 22 ji mewsima havînê re hiştiye. Me semad û mazot ji bo avdana duyemîn li cotkarên gundewarên Dêrazorê belav kirin. "
Enes El-Hesanî diyar kir ku wan di aliyê miqdarê mazota ji bo çandiniyê de rastî zehmetiyan hatin, lê ev yek derbas kirin û ji bo her dominekî 10 lître mazot hate belavkirin.
El-Hesanî wiha pêde çû: "Destekdayîna ji zeviyên çandiniyê re bi vî awayî ye: 20 lître ji her 1 donim ji zeviyên ku bi rêya bîrên tirwazî têne avdan, 10 lître ji zeviyên nêzî keviyê çemê Firatê. Pêwîstiya herêmên gundewarên Dêrazorê bi awayekî giştî bi 16 milyon lître mazot heye."
Têkildarî semadê jî El-Hesanî wiha domand: "Ji bo avdanê yekemîn me 515 ton semada yoryo belav kir. Niha jî em dixebitin da ku hezar û 50 ton ji semad yoryo li hemû aliyan re belav kir. Ji wan 250 ton ji herêma rojhilat, 250 ton ji aliyê navîn, 200 ton ji aliyê rojava re û 300 ton ji aliyê bakur re."
El-Hesanî anî ziman ku miqdarê semadê têrê nake û pêwîstiya cotkarên tevahî herêmên Dêrazorê bi cih nayne.
Hevserokê Komîteya Çandinî û Avdanê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê Enes El-Hesanî wiha dawî li axaftina xwe anî: "Komîteya çandiniyê dê destekê bide cotkarên herêmê û avdana 5 caran misoger bike. Em hêvî dikin ku cotkar hemû berhemên xwe bibin Şîrketa Pêxistina Civaka Çandiniyê da ku parastina genim û peydakirina wê li herêmê bikin."
***ANHA***

# "Paqijiya bajêr neynika çand û hişmendiya civakê ye"

**Rêvberiya Mekteba Jinan ya Komîteya Şaredarî û Ekelojiyê ya Kantona Hesekê Nûra Mehmûd Şihab da zanîn ku paqijiya bajêr hişmendî û çanda civakê dide diyarkirin û got, ji bo wê paqijiya bajêr erkê li ser milê her kesî ye.**

Bi pêmana 8'ê Adarê Roja Jinan ya Cîhanî, Rêxistina Kongra Star 23'yê Sibatê rêzeçalakiyên xwe yên derbarê 8'ê Adarê de, bi daxuyaniyekê li Herêma Cizîrê eşkere kirin. Bi heman mebestê, Mekteba Jinan ya Komîteya şaredarî û Ekelojiyê ya Kantona Hesekê bi tevlîbûna Kongra Star, saziyên civaka sivîl bi armanca ekolojiyeke paqij û bitendurist û bi pêmana 8 'ê Adarê dest bi hemleya paqijkirina Kantona Hesekê – Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kirin. Hemleya paqijiyê ya bajarê Hesekê li çarxeriya Rojava ya ku dikeve destpêka bajêr hat destpêkirin.
Têkildarî vê mijarê Rêvberiya Mekteba Jin a Komîteya Şaredarî û Ekelojî ya Kantona Hesekê Nûra Mehmûd Şihab axivî.



***"Paqijkirina bajêr berpirsyariya her kesî ye"***

Nûra Mehmûd Şihab Roja 8'ê Adarê li tevahî Jinên cîhanê pîroz kir û bal kişand ser girîngiya parastina çanda paqijyê û wiha dirêjî da axaftina xwe: "8'ê Adarê ji bo her jinê bi wate ye, roja 8'ê Adarê roja wekhevî û mafdayînê ye. Bi boneya 8'ê Adarê me gelek çalakî dane ber xwe, yek jê hemleya paqijiya bajar e. Ji sibehê ve me dest bi hemleya xwe kiriye, me çarxeriya destpêka bajar û kolanên fermî kiriye hedef. Paqijiya bajar pir girîng e, dema mirov derbasî bajarekî dibe pêşî li ekolojî û paqijiya wî bajarî dinêre, wê demê çand û hişmendiya wî gelî diyar dibe. Ji bo wê jî paqijiya bajar berpirsyariya hemû welatiyan e."

Nûra Mehmûd Şihab da zanîn ku paqijiya bajar mirovan ji nexweşiyan diparêze û wiha axivî: "Pêwîst e her kes ji mal, kolana xwe dest pê bike, paqijiya bajar ne tenê li ser milên şaredariya gel bihêle, alîkariya karkarên paqijiyê erkeke exlaqî ye. Dema her kes bibe alîkar û bajar were paqijkirin dê xelkê wî bajarî ji nexweşiyan dûr bikeve."

***"Xwedî li çanda paqijiyê derkevin û xwe ji nexweşiyan biparêzin"***

Nûra Ehmûd Şihab destnîşan kir ku jin ji bo rûniştandina çanda paqijiyê di nava tevgerê de ne û wiha anî ziman: "Jin ji bo avakirina ekolojiyek paqij û bi tendurist li mal, kolan û bajarê xwe kar û xebatan dikin. Pêwîst e em çanda paqijiyê di nava civaka xwe de bidin rûniştandin da ku em wan ji nexweşiyan biparêzin. Bi heman mebestê di rojên pêşiya me de em ê daran biçînin da ku



bajarê xwe bi boneya 8'Adarê bixemlînin û xweşik bikin".


Nûra di dawiya axaftina xwe de bang li her kesê kir ku xwedî li çand û bajarê xwe derkevin û xwe ji nexweşiyan biparêzin.
***JINHA***



# HPG: Sê dagîrker hatin cezakirin çeperek hat tinekirin

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand ku gerîlayan li herêma Metîna çepereke artêşa Tirkan ya dagîrker tine kirine û sê dagîrker ceza kirine.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê da zanîn ku di çarçoveya 'Pêngava Şoreşger ya Cenga Xabûrê' de li Metîna çalakiyek pêk anîne.
Di daxuyaniya HPG'ê de ev agahî hatin dayîn:
"Di 2'ê Adarê saet di 16.00'an de hêzên me yên YJA-Starê bi çekên giran li dagîrkerên li Girê Ortê yê girêdayî xeta Qaşûrê dane. Di vê çalakiyê de çepereke dagîrkeran hate îmhakirin, 3`ê dagîrker hatin cezakirin û 2 dagîrker jî birîndar bûne.
Di 23'ê Sibatê de saet di 14.00'an de Qada Girê Hakkarî ya girêdayî herêma Metînayê 3 caran, di 24'ê Sibatê de qadên Kunîşka, Kela Bedewê, Karker û Sîda yên herêma Zapê 9 caran bi balefirên şer hatine bomberdûmankirin.
Di 25'ê Sibatê de saet di 14.00'an de Golkaya herêma Metînayê û qadên Çemço yên girêdayî herêma Zapê bi balefirên şer 4 caran hatine bomberdûmankirin.
Di 26'ê Sibatê de Girê Şehîd Şerîf yê Xakurkê, Serê Metîna ya girêdayî Metîna û qadên Şikefta Birîndaran ya Zapê bi balefirên şer hatine bomberdûmankirin.
Di 27'ê Sibarê de Girê Ortê yê girêdayî Metînayê 2 caran û qada Saca ya girêdayî herêma Zapê carekê bi balefirên şer hatiye bomberdûmankirin.
Di 28'ê Sibatê de Deriyê Hirçê yê herêma Garê du caran û Girê Ortê yê Metînayê 3`ê caran bi balefirên şer hatine bomberdûmankirin.
Di 1`ê û 2'ê Adarê de qadên Çemço û Kunîşka yê herêma Zapê bi balefirên şer 4 caran hatine bomberdûmankirin.
Di 2'ê Adarê de saet di navbera 16.20-18.00'an de qada Werxelê ya girêdayî Avaşînê bi balefirên şer û çekên giran sê caran hatine bomberdûmankirin"



# Ji bo şehîdên Xelîfanê 150 roj in çalaki didomin

**Gelên Rojava, ji bo ku cenazeyên gerîlayên di kemîna PDK'ê de şehîd bûyîn bistînin ji 5'ê Cotmehê ve çalakiyan didomînin.**

Gelên Rojava ku ji bo cenazeyên gerîlayên ku di kemîna PDK'ê de şehîd bûbûn bistînin ji 5'ê Cotmeha 2021'ê ve tim li qada ne û dibêjin, ''Çalakî, meş, mîtîng, grêvên birçîbûnê her çi hewce bike em ê bikin lê em ê cenazeyên xwe ji xayinan bistînin. Hewce bike di vê rêyê de em ê şehîd jî bibin'' û ev 150 roj in çalakiya xwe didomînin.
Hêzên Parastina Gel (HPG) 3'yê Cotmeha 2021'an di daxuyaniyê de ragihandibû şeva 29'ê Tebaxê saet li derdora 02:3'an komeke gerîla ya ku ji heft kesan pêk hatî dema ku ji qada Qendîlê dixwestin bicine herêma BehdînaNê PDK'ê ew kirine kemînê û wiha gotibû: ''Zelal bûye di encama vê êrîşê de 5 hevrêyên me bi teqezî şehîd bûne, hevrêyeke jî bi îhtîmal dibe ku bi birîndarî hêsîr ketibe. Hevrêyê me Hakî ku di nav koma heft kesî de bû, rasterast ev rûdan dîtiye û piştî demekê bi sax û silamet ji cihê rûdanê



dûr ketiye. Hevrêyê me Hakî xwe gihandiye hêzên me û êrîşa ku bi destê hêzên PDK'ê pêk hatî ji gelek aliyan ve zelal kiriye.''

**Li Sêmalka çalakiya 111 rojan**

Di serî de li Rojava li çar parçeyên Kurdistanê û li Ewropayê Kurdan piştî ku HPG'ê derheqê rûdana li Xelîfanê daxuyanî da derketin qadan.
Gelên Rojava 5'ê Cotmeha 2021'an li Sêmalka ya li ser sînorê Rojava-Başûrê Kurdistanê dest bi çalakiya domdar kir. Çalakiya ku 111 rojan dom kirî, bi daxuyaniya ''Têkoşîna me wê li hemû qadan bidome'' li Sêmalka hate qedandin. Li hemû qadên Rojava, Bakur-Rojhilatê Sûriyê ev ji 150 rojî zêdetir e çalaki didomin û xayintiya PDK'ê tê protestokirin.



**PDK'ê êrîş bire ser çalakiyê û ambargo danî ser Rojava**

Di roja 77'an a çalakiya Sêmalka de 15'ê Kanûna 2021'an hêzên PDK'ê êrîş birin ser çalakgeran. Di êrîşa PDK'ê de 2 jê bi giranî 15 kes birîndar bûn. Piştî êrîşê roja dî sînor hate girtin û ambargo û dorpêç hate danîn.
Gelên Rojava bi çarçoweya fermanên dewleta Tirk a bi destê PDK'ê li dijî girtina Deriyê Sînor ê Sêmalka derketin qadan û ev biryar şermezarkirin.

**Dengê ji Kobanê: Emê bi ruhê berxwedanê dagîrkeriyê têk bibin**

Bi pêşengiya Meclîsa Malbatên Şehîdan a Herêma Firatê ji bo ku cenazeyên gerîla werin standin 20'ê Sibata 2022'an bi dirûşma, ''Bi berxwedana Kobanê em ê dagirkeriyê û xayintiyê têk bibin'' li Kobanê çalakiya kondanînê çêbû. Di çalakiyê de hate gotin, ''Gelê Kurd û fedayiyên wê, xeta berxwedanê danîne ber xwe, PDK jî xeta îxanetê. PDK bi hevkariya bi dijminên Kurd re ispat kir ku li dijî yekîtiya Kurd dijminatiyê dike.''

**Li herêma Cizîrê meşa girseyî**

Gelên Herêma Cizîrê 28'ê Sibata 2022'an ji bo şehîdên Xelîfanê li Tirbespiyê hatin cem hev. Di meşê de bi deh hezarnan kes hazir bûn. Hate gotin,''Em hevkariya PDK'ê ya bi dewleta Tirk re şermezar



dikin, em bang li gelê Başûrê Kurdistanê dikin ku destekê bidin têkoşîna azadiyê. Hevkariya PDK'ê û Erdogan teşhîr bikin.''

**Gelê Efrînê li ser piyan bû**

Efrîniyên ku ji ber êrîşên dagirker bêgav man ku koçî Şehbayê bikin ji bo ku PDK'ê şermezar bikin 2'yê Adarê bi diruşma 'Bimre Xayintî' ji navçeya Ehdasê ya Şehbayê heta bi Deriyê Serdemê meşiya. Di meşê de hate gotin, 'Xayintiya malbata Barzanî heta îro didome û her roj zêdetir dibe. Şehîdên me heta dawiyê li dijî xayintiyê li ber xwe dan.'
***ANF***

# Sempozyuma li ser zehmetiyên li pêşiya jinên lêkolîner yên Tûnisê

**Komeleya Niştimanî ya Lêkolînerên Jin û Yekîtiya Niştimanî ya Jinên Tûnisê bi pêmana Roja Jinên Cîhanê sempozyumeke zanistî li ser zehmetî û astengiyên li pêşiya lêkolînerên jin yên Tûnisê li dar xistin.**

Bi pêmana 8'ê Adarê Roja Jinên Cîhanê, 2'yê Adarê Komeleya Niştimanî ya Lêkolînerên Jin û Yekîtiya Niştimanî ya Jinên Tûnisê sempozyumek zanistî bi dirûşma "Rola jin û keçên ciwan di warê zanistî de li Tûnisê çiye?" li ser zehmetî û astengiyên li pêşiya lêkolînerên jinê Tûnisê lidarxistin. Di sempozyûmê de komek ji aktîvîst û lêkolînerên jin ên ku di karê xwe de rastî zehmetiyan hatine, beşdar bûn.

**"Divê jin di lêkolîn û îcadan de bi ser bikevin"**

Seroka Beşa Dibistana Bilind a Pîşesaziya Xwarinê Dr. Fatin Qişûrî têkildarî mijarê ev nirxandin kir: "Ji ber çend sedeman ne hêsan e ku jin bibe lêkolîner. Yek ji wan jî ew e ku pêwîst e peywira xwe ya lêkolîneriyê bi lênêrîna malbata xwe û mezinkirina zarokan re li hev bîne. Lêkolîn û îcad yek ji wan kêşeyên ku divê jin di wan de bi ser bikevin û hemû zehmetiyan derbas bikin. Di hemû zehmetiyan de ez bi ser ketim û hîn jî bi zehmetiyên din re rû bi rû me, lê divê hûn bi sebir û hêvî bin."

**"Di xebata lêkolîn û îcadê de jin rastî destavêtin û devavêtinê tên"**

Seroka Yekîtiya Neteweyî ya Jinan Radiya El-Jerbî jî got ku dema lêkolînerên jin dosyayê ji bo fînansekirinê pêşkêş dikin rastî tacîzê tên û wiha pê de çû: "Ne maqûl e ku mirov ji jinek lêkolîner bixwaze ku belgeya jêhatiya pîşeyî bide da ku lêkolînê bike, dema ku ew xwediyê doktorayê be jî."



**"Lêkolînerên jin rastî zehmetiyên îdarî û pirsgirêkên darayî tên"**

Rêvebera Komeleya Niştimanî ya Lêkolînerên Jin Najla Bin Mîlûd jî diyar kir ku lêkolînerên jin rastî zehmetiyên îdarî û pirsgirêkên darayî tên û wiha domand: "Em dibînin ku hejmara xwendkarên zanîngehan ji sedî 60 jin in. Civak hîn jî tenê xwedîkirina zarokan weke erkê jinê dibînin."
***JINHA***

# Hêmana herî mayînde ya demokratîkbûnê azadiya jinê ye

Jina bi kêmayî tê dîtin, bingehê wê derewa herî rajêr ya mêrê windakirî ye û hêmana herî mayînde û berfireh ya demokratîkbûnê, dîsa azadiya jinê ye.

**Rêber APO**

Di şaristaniya Rojhilata Navî de hebûna jinê, di çareserkirina hemû pirsgîrêkên civakî de, di rewşa navendê de ye. Bê ku em pêşveçûna wê ya dîrokî dubare bikin, ji bo dema pêş pêwîst e dirûşma me ew be ku em şkandina zayendî ya sisiyan li dijî mêr pêk bînin. Heta ku wekheviya zayendî ya civakî pêk neyê, daxwaziya azadî û wekheviyê nayê ti wateê û ev pêk nayê. Hêmana herî mayînde û berfireh ya demokratîkbûnê, dîsa azadiya jinê ye.



### Pratîka civakî ya herî ne baş, serdestiya mêr ya ku bi ser jinê de disepîne ye

Aliyê lawaz yê sîstema ku jin kiriye mal, dîsa pirsgirêka jinê ye. Herî baş jin di wê rewşê de ye ku rola çîna karkeran ya demekê bîne cih e. Berî çînîtiyê pêwîst e esîltiya jinê were dahûrandin da ku çînîtî û neteweyîtî were fêmkirin û çareserkirin. Azadiya jinê ya rast, bi rakirina viyan û hestên koleker ên mêr, bav, dildar, bira dost û hwd. encex gengaz bibe. Evîna herî baş, xweyîtiya herî xeternak e. Heta ku em hemû qalibên raman, ol, zanist û huner ên ku bi serdestiya mêr nexin bin nirxandineke tund, nasnameya jinê ya azad dernakeve holê. Pêwîst e pêşî jin bibe malê xwe da ku ji malbûnê rizgar bibe. Jina ku ketibe rewşa mal û xweyîtiyê, wê pêşiyê li birûmetbûna mêr jî bigire. Rabûn û rûniştina bi jineke wiha re, ji bo mêrê azad jî asteng e. Jineke ku wiha hatibê daxistin, ji berevajî ve dibe mêrê daxistî.

Girêdana asta azadiya civakê ya bi asta azadiya jinê ve, destnîşankirineke rast e. Dema em ji aliyê xweşikayiyê ve li mijarê binihêrin, diyar e ku kesê ne azad be xweşik jî nabe. Herwiha jiyanake ku nexweşik be, encex li sînorên prîmat pêkwere. Weke nihêrîna li damezraka huner, nîhêrîna li damezraka jinê ê rasteqîntir be. Ne weke mal û milk, ne weke karker û gundiyan. Dîtina jinê ya weke perçeyê hestyar ê xwezayê, fêmkirina ku pîroziyekê hildigire, bangkirina wê ne bi zimanê mêrê serdest, têgihîştina zimanê jinê yê bisir, ji aliyê jiyaneke xweşik ve, pir girîng e. Pratîka civakî ya herî ne baş, serdestiya mêr ku li jinê ferz dike û bêteşeya wî ye. Ti tişt li qasî helwesta mêr a hov ku li ser jina bêçare hatî hiştin, ne qederparêz e. Li gor min mêrê herî bihêz, têgihiştî, hestyar, yê ku ji wekhevî û azadiyê fêm dike, herwiha demokrat û civaka bi wan ve girêdayî, bi pîvanên li hember jinê ku em destnîşan dikin û bicîhanîna pêdiviyên wê dê pêkwere.

### Civaka di koletiyê de kûr bûyî, civaka ku jinê biçûk dixe ye

Civaka ku herî bêtir di koletiyê de kûr bûyî, civaka ku jinê biçûk dixe ye. Civaka ku herî bêtir ji jiyanê fêm nake jî, civaka ku jiyaneke bêser û ber bi jinê re qebûl dike ye. Dîsa jiyana herî ne baş û ji peroşdarî û watedariyê dûr, jiyana bi jina kole re ye.

Dema em di bin van nirxandinan de li civaka Rojhilata Navîn binihêrin, em ê çêtir fêm bikin bê çima li paş e, bê wate, zalim, kereh û tênegihîştî ye. Ev yek baş diyar e, dema ku civaka mêr hevqasî hêsan, ji xweşikayiyê dûr û weke mêl li jinê binihêre, bextewar nabe û dê ji aştiyê bêpar di nava kerehiyê de bijî. Civakên mêr ên bi vî rengî, nikarin pîroziya jiyanê, bilindayiya welat, rûmeta rast û nêzîkayiyeke bi wate ya li xwezayê biafirînin. Dema ku nikaribin biafirînin jî, wek hêncetê dê “jina şeytan” nîşan bidin. Şeytan û jina ku bi kêmasî tê gotin, dereweke mêrê ku herî bêtir winda kiriye. Hata ku li hember bîrdoziya bi serdestiya mêr, sinc, hêza civakî û takekesan têkoşîneke hêzdar neyê dayîn, jiyana azad nayê qezenckirin. Civakeke demokratîk a ras nayê afirandin. Herwiha weke wekheviyê sosyalîzm jî nayê pêkanîn. Vebijarka polîtîk a gelan tenê ne demokratîk e, civaka demokratîk û zayenda azad e.

Bîrûbaweriya jinê ya azadiyê û tevgera wê, nirxê herî bilind ê rêhevaltî û mirovatiyê ye

Bi awayek berbiçav têkoşîna azadiya jinê, ji damezrandina partiya xwe heta bi tevgera jinê ya girseyî, heta bi rêxistinbûna civaka sivîl û heta bi damezrakbûna siyaseta demokratîk, pêwîste di nava hev de were meşandin. Jin çiqas ku ji destê civaka bi serdestiya mêr rizgar bibe, bi înisiyatîfa xwe ya azad tevbigere û bihêz bibe, dê hewqasî bibe xwedî kesayetiyeke azad û xwedî nasname. Sergirêdana jinê ya zûka, koletiya herî zalim e. Negirêdana serî ango “aqil”, helwesta herî esîl e. Em ji çarçef û laçikê bigirin heta bi porno, rajêriya sepandinên ku bi destê mêr li ser jinê tên ferzkirin, ti caran li qasî xirabiya çîn û neteweyan nabe. Herwiha destekdayîna hêrsa jinê, bîrûbaweriya wê ya azadiyê û tevgera wê, nirxê herî bilind ê rêhevaltî û mirovatiyê ye. Rojhilata Navîn liqasî çanda xwedawendiyê, herêmeke şaristaniyê ye ku koletiya jinê herî bêtir lê tê jiyandin e. Pêwîste bi pêkanîna sêyemîn a şikandina zayendî, ji bo jinê meşeke mezin bête destpêkirin. Rabûna ketinên mezin jî dê mezin be. Di vî bingehî de, dema em weke bawermendên ola xwedawendeke nû nêzîk bibin, em ê bigihîjin dayîkbûna pîroz û jinîtiya evînê yên ku em heq dikin.

# ‘Em ji her demê zêdetir nêzikî azadiyê ne’

**Fermandara Biryargeha YJA Starê Xelat Şemsê diyar kir çi kesê ku dilxwazên azadiyê ne, berxwedana jinên Kurd moralê wan geş dike, wêrekiyê dide wan û got “Em ji her demê zêdetir nêzikî azadiyê ne.”**

Xelat Şemsê diyar kir sala 2022’an wê giran derbas bibe lê ji her demê zêdetir nêzikî azadiyê ne û got, “Em hêza parastinê ya gel û jinan, em ê ji bo jiyaneke azad tişta ku dikeve ser milê me bi cih bînin. Dirûşmeya civîna me jiyana azad û Rêbertiya azad e. Êdî divê em pergala Imraliyê qebûl nekin. Ji bo azadiya Rêbertî em ê hêzên xwe seferber bikin.’’

Yek ji Fermdandara Biryargeha YJA Starê Xelat Şemsê têkilî civîna Konseya Fermandara YJA Starê û şerê di navbeyna dewleta Tirk û gerîlayan de axivî.

Şemsê wiha got: “Em bi îdîayeke mezin ketin sala 2021’an. Dewleta Tirk a dagirker jî, ji bo ku gelê Kurd û Tevgera Azadiyê tine bike her cure rêbaza gemarî bi kar anî. Li dijî tevgera me konsepta şer a hov danîn. Şerê dewleta Tirk ne ji rêzê ye, şerekî bêsinc e. Bi êrîşên kimyewî xwestin ku vî şerî bibin serî. Ne şerekî normal bû. Dijmin ê ku dixwest ku tevgera me îmha bike, asta êrîşan pir zêde kiribû. Lê gerîlayan planên dijmin pûç kir. Desthilata faşîst a AKP-MHP’ê belkî di dîroka xwe de cara pêşî ye ku ev çend zor lê dibe. Helbet ev bi fedekariya têkoşîna şehîdên me yên leheng e. Hevrêyên me yên leheng ku di berxwedanê de şehîd bûn dilsoziya xwe ya bi jiyana azad re careke dî danîn holê. Têkoşîneke bêhempa dan û şêwazeke nû ya şer danîn holê. Bûne pêşengên guherîn û veguherînê. Bi vê bingehê pêngavên nû danîn. Bi çarçoweya Cenga Xabûrê, Egîdê Botanê di serî de li Zagros, Avaşîn, Zap û Metînayê li gelek qadan derbên giran li dijmin dan. Helbet helwesta hevalên jin jî pir girîng bû. Bi rengekî bê dudulî bi biryardarî şer kirin.”



Xelat Şemsê diyar kir berxwedana gerîla derb ne tenê li faşîzmê daye, her wiha derb li wan hemû desthilat û dagirkeran daye ku li pêşiya azadiya gelan û jinan dixwazin bibin asteng û got, “Gerîlayên jin jî bi wêrekî û bêyî dudiliyekê xwedî li vê pêvajoyê derketin. Ne dudilî bûn û ne jî astengî li ber xwe dîtin. Li dijî tank û topên dijmin bûne xwedî helwesteke fedayî. Helbet, vê rewşê moral û wêrekî da her kesî. Gelek serkeftiyên me çêbûn. Hemû dilxwazên azadiyê ji berxwedana jinên Kurd moral û wêrekiyek standin. Ev berxwedan ji bo xwe weke hêviyê dîtin. Ez bawer dikim van rojên li pêşiya me em ê têkoşîna xwe geştir bikin. Li dijî dijmin ji bo ku em nirxên Kurdistanê biparêzin li her qadê em ê şer bikin. Di civîna me de encamên şer û berxwedana sala 2021’an bi berfirehî hate nirxandin. Em pê dizanin ku sala 2022’an wê giran be. Lê morale me geş û em bi coş in. Em ji her demê zêdetir nêzîkî azadiyê ne. Em hêza parastina gel û jinan, ji bo paşerojeke azad tişta ku dikeve ser me em ê bikin. Dirûşmeya civîna me jiyana azad û Rêbertiya azad e. Êdî divê em bi ti rengî pergala Imraliyê qebûl nekin. Ji bo ku em azadiya Rêbertiya xwe bi cih bînin, em ê hêza xwe seferber bikin.”

***ANF/BEHDÎNAN***



# Nisrîn Ebdullah: Emê parêzvanên mîrateya Clara Zetkîn û Rosa Luxemburg bin

Fermandara YPJ`ê got, emê parêzvanên mîrateya Clara Zetkîn û Rosa Luxemburg bin, lê em têkoşîna xwe mehkûmî rojekê tenê nakin. Herwisa divê jinên cîhanê rêxistineke hevgirtî, biarmanc û li ser rêgezên têkoşîna zanistî ya hevbeş ava bikin.

**Serbest Etê-Qamişlo**

Têkildarî Roja Jinên Cîhanê 8`ê Adarê, Fermandara Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) Nisrîn Ebdullah ji rojnameya me re axivî.

Fermandara YPJ`ê destpêkê jinên cangoriyên azadiyê bi rêzdarî bîr anîn û ev nirxandin kir: “YPJ, di bîranîna jinên ji bo rewakirina 8’ê Adarê xwe kirîn qurban, dijî û kêliyên têkoşîna wan zindî dike. Em baş dizanin ku ev roj bi hêsanî bi dest neketiye û 120 jinan canê xwe gorî kir. Em jî soza têkoşînê bi bîranîna wan nû dikin û heta dawî emê şopdarên daxwazî û xeyalên wan yên misogerkirina mafên jinan bin.”

### ‘Ji bo têkoşînê rojek ne bes e’

Nisrîn Ebdullah herwiha diyar kir ku YPJ xwe mehkûmî rojeke ji aliyê sêstema desthiladar ve hatî diyarkirin nake û axaftina xwe wiha domand: “Ev roj ji bo me, roja nûkirina plan û projeyên têkoşîna xwedîderketina li mfên jinê ye. Têkoşîna YPJ dike, ne têkoşîna koma jinên xwedîçek e; YPJ, jinên rêxistinkirî ne û xwediya îdelojiyeke wisa ye ku li hemberî sîstema desthilatdar ya mêr têdikoşe. YPJ têkoşîna avakirina jin, mêr, civak û cîhaneke nû dike. Ez bi baweriyeke xurt dibêjim, emê şopdar û parêzvanên mîrateya Clara Zetkîn û Rosa Luxemburg bin. Emê xewn û xeyalên wan bi têkoşînê bikin rastiyên misogerbûyî.”

### Durûtiya sîstema desthiltdar ya mêr

Herwiha li ser girîngiya çareserkirina doza azadiya jinê, fermandara YPJ`ê wiha axivî: “Bi serkeftina doza azadiya jinê, wê pirgirêkên civak û welatan tev bên çareserkirin. Herwiha wê durûtiyê di qada zagon û mafan de bê rakirin. Lewra peymanên navnetweyî derbarê mafên jinan de, mixabin tenê niviskî dimînin. Hê mafên jinê tên binpêkirin, ji her milî ve mafê biryara jiyana azad, kar, zewac, zagon û hwd. tên paşguhkirin. Hê jin tê sinetkirin, destdirêjî lê tê kirin û ti zagon wê naparêzin. Ev jî dibe egera têkoşîna me.”

### `YPJ`ê nasnameyên parçekirina jinê ji holê rakirin`

Têkildarî destkeftiyên jinê yên di nava şoreşa Rojava de Nisrîn Ebdullah diyar kir ku têkoşîna YPJ`ê nasmeyên sexte yên bi ser jinê de hatîn spandin yên mîna koletî, çînîtî û olî şkandin û jin bû xwedînasnameya xwe û ev agahî dan: “Jixwe van nasnameyan ne kesayeta jinê tenê parçe dikir, civak jî parçe kiribû. Ji ber wê divê jin bi têkoşîna xwe faktorên parçebûnê ji holê rake. Jinên cîhanê jî eger di çarçoveyeke yekgirtî de û bi armancên hevpeş têbikoşin, wê bikarin cîhaneke bi rengê xwe biafrînin. Li bakur û rojhilatê Sûriyê ev di lûtkeya jor de bi pêşengiya YPJ`ê pêk hat. Jin bi biryara xwe rengê xwe û yê jiyana xwe hildibjêre û ti kes nikare ti pergalan bi ser me de bispîne. Ji ber wê, jinên azadîxwez yên ji aliyê erdnîgarî, civakî û çandî ve ji me dûr, hatin tevlî vê têkoşînê bûn û yên mîna şehîd Avaşîn (Almanî), Şehîd Hêlîn (Ingilîz) û gelek hevalên enternasyonalîst li ser vî erdî ji bo aramnacên pîroz şehîd bûn.”

### ‘Çeka YPJ`ê, rêxistin, xweperwerdekirin û zanist e’

Fermandara YPJ`ê herwisa bal kişand ser girîngiya çek û perwerdeyê û wiha anî ziman : “Cîhana di nava şer de be, divê mirov û civak jî xweparstinê erkê bingehî bibînin. YPJ jî li welatekî wisa ye ku li hemberê wî, ev çend sal in, hem êrişên rejiman, hem yên çeteyan didomin. Vê rewş jî neçariya rakirina çekan bi xwe re anî. Lê me bi felsefeya xweparstinê, çek rakir û emê ti carî nebin hêzeke êrişkar. Herwisa wê çek ti carî ji me re nebe amûrê sereke yê parastinê. Ji destpêkê ve bi dirûşma `Eger hêza me têra binxistina cîhanê tevê jî bike em êrişî ti kesî nakin, lê eger dinya tev jî êrişî me bike, emê li ber xwe



bidin` me xwe bi rêxistin kir. Eger jin bixwe xwe neparêze, bira, bav û hevjîn wê nikaribin wê biparêzin. Mînaka êrişên çeteyên DAIŞ`ê yên ser Şingalê jî vê teqez dikin. Eger 10 jinên rêxistinkirî hebûna, wê rewşeke wisa xerab neqewimîbûya. Jixwe çek tenê nabe hêza xweparstinê, divê ev çek bi felsefe û îdeolojiyeke zanistî bê rakirin. Jin wê xwe bi xwenaskirin û zanebûna hebûna xwe biparêze. Ji ber wê em perwerdeya îdelojîk didin pêş. YPJ`ê jî bi misogerkirina rast ya bikaranîna çek, xwe perwerde kir, xwe bi rêxistin kir, xwe û civaka xwe parast. “

### ‘Pêwîstî bi rêxistineke jinan ya cîhanî û hewzeke tecrûbeyên têkoşînê heye’

Li ser hêza ku YPJ xwe dispêriyê û girîngiya avakirina rêxistineke jinê ya cîhanê, Nisrîn Ebdullah axaftina xwe wiha domand: “YPJ di armancên xwe de pir zelal e û her tim wê têkoşerên parstin û zanakirina jinê be. Herwiha emê têkoşîna avakirina sîstemeke dermokratîk, azad û wekhev bidin. Em hêza xwe ji parastina xwe ya rewa tenê digirin,ji ber wê divê civak û jin bê hêza cewherî nemîne. Lê nebe xwedîartêş, lewra yek ji têkoşîna me ya bi sîsteman re em li dijî hişmendiya artêşbûnê şer dikin. Pêwîstiya jinên cîhanê ji bo têkoşênê bi xwerêxistineke cîhanî heye. YPJ jî pêşengiya vê têkoşînê dike. Lê mixabin gelek tevgerên jinan ku li şûna têkoşîna azadiya jinê bikin, dikevin xizmeta sîstema desthiltdar. Ev tevger, ji naveroka xwe derdikevin û têkoşîna jinê temsîl nakin. Armanca me ya sereke avakirina rêxistineke cîhanî ya jinê ye. Rêxistineke yekgirtî wê biarmanc û bi rêgezên têkoşîna zanistî ya hevpeş be. Çimkî em di wê baweriyê de ne ku cîhana niha, bi serkêşiya hişmendiya sermeyadar ya mêrê desthiltdar dişewite. Ya bikare vê rewşê biguherîne wê jin be. Divê têkoşîna jinê jî li her welatî bi rengekî guncaw bê kirin. Li hin welatan pêwîstiya jinê bi rakirina çek heye, li hin welatan jî têkoşîn di warê maf, zagon, çand û hunerê de ye. Lê tevî wê jî pêwîstiya jinên cîhanê bi hewzekî -ku tevayiya tecrûbeyên jinê li kom bibin- heye, ji bo ku jê sûd bigirin.”

### `Bidestxistina maf û azadiya jinê, wê tevayiya gelên cîhanê azad bibin`

Fermandara YPJ`ê Nisrîn Ebdullah herwisa diyar kir ku cîhan di pêvajoyeke ku mirovayî ji ber sîstema desthilatdar ya mêr de tê tinekirin û axaftina xwe wiha qedand: “Pêwîst e jin, bi zanistî û vîna azad ji bo azadiya xwe têbikoşe. Ji ber wê em bang li jinên cîhanê dikin ku roja 8’ê Adarê bi helwesteke bihêz û hevpeş, rêxistineke berfireh ya cîhanî ava bikin. Lewra bi bidestxistina maf û azadiya jinê, wê tevayiya gelên cîhanê azad bibin û mafên xwe bi dest bixin û cîhaneke aram û bi aştî ava bibe. Em bi hev re şoreşa nan û gulê li ser xeta azadiya jinê ji bo wekhevî, azadî û aştiyê bidomînin.”



## Adîfe Sakik û 8’ê Adarê

**Faruk Sakik**

Di 8’ê Adara 1985’an de li çiyayê Sason, li gundê Telor şerek qewimî û 8 gerîla şehîd bûn. Di nav wan de jinek jî hebû. Navê wê Adîfe bû..Bêrîvan bû..Ji bajarê Mûşê ji gundê Zengokê bû..Gerîlaya yekê ya jin ya wê heremê û xwîşka min (FS) bû..

Her sal di 8’ê Adarê Roja Jinên cîhanê de behsa têkoşîna jinên Kurd tê kirin. Disa hersal di têkoşîna jina Kurd e behsa şehîdên salên 80’ê yî tê kirin. Navê Adife jî derbas dibe. Çi tesaduf Adîfe jî di 8’ê Adarê de şehîd bûbû.

Adîfe berî ku bibe Bêrîvan, li gundê xwe wek jineke Kurd ya ji rêzê, di nava zeviyên Tutinê de dixebitî. Li ser Adife zilma malbatê û civakê hebû. Ti qedir qîmetê wê tinebû. Adîfe jî wek tevayiya jinên din bi qedera xwe razî bû. Li gundê wê jî wek her deverê, rolên cinsiyetperest yên li jin û mêr hatibûn barkirin hebûn. Vê rewşê bi xwe re, kodên koletî û serdestiyê dihewandin. Di vê jiyanê de cinsiyetparêziyê jin dixist pozisyona koleyan. Lê dema ku di sala 1979’an de komek Apoyî hatin gundê wê, wê roj hişê Adîfe jî hat serê wê.

Di nava vê komê de Haydar Karasûngûr hebû. Karasûngur di axaftineke xwe de behsa azadiya jinê û ramanên Rêber Apo yên derbarê jinê de kiribû. Adîfe ji van axaftinan pir bibandor bûbû. Partiyeke bi navê PKK’ê hatibû avakirin û di vê partiyê de behsa azadiya jinê hatibû kirin. Adîfe, biryar da bibe Apoyî û ji bo azadiya Kurdistanê têbikoşe. Lê diviya destpêkê jin azad be ku bikare ji bo azadiya Kurdistan têbikoşe. Gotineke rêber Apo hebû. Digot, afirandina jineke azad ji azadkirina welatekî zahmetir e. Adîfe li gund di nav jinan de dest bi xebatê kir. Ji koma Apoyiyan çi agahî digirt di nava jinan de belav dikir. Navê wê êdî Adîfeya Apoyî bû.

Roj hat êdî ji bo wê, ew dem bû. Êrişên dijmin jî dest pê kiribûn. Banga rêber Apo jî hebû digot ‘dive jin werin di nava têkoşînê de bi awayekî çalak cih bigirin û bibin gerîla’. Diviya Adîfe jî, biryarekê bide. Di sala 1984’an de ji bo Adîfe salên gerîlatiyê û paşrojek pirr zelal dest pêkir. Li çiyayên Andokê azad û navê wê jî êdî Berîvan bû.

Li ser daxwaziya rêber Apo, jinên Kurd yên weke Adîfe bi rêxistin dibûn û berê xwe didan nava refên gerîla. Dema xeberên ‘gerîlayên jin’ di nava civakê de belav dibûn, zihniyeta zilam ya li dijî jinê jî ji hev belav dibû.

Di wan salan de li Kurdistanê bingehê azadiya jinê, bi berxwedana Sakîneyan û bi şahadeta Adîfeyan hatibû avêtin. Li ser vê bingehê li Rojava şoreş pêk hatibû û jinan li eniya pêş cih girtibû. Artêşa Adîfeyan-YPJ dema li Kobanê destaneke nû ya jinê nivisî, cîhanê şahidî kir. Jin, li ser vê bingehê, îro li cîhanê ji têkoşîna jinan re pêşengiyê dike. Ew bûn sebeb ku îro li gelek navendên cîhanê dengê “jin jiyan azadî” bilind dibe.

Dema Adîfe, 8’ê Adara 1985’an, di şer de şehîd bû, bi şahadeta xwe peyamek jî dabû jinên Kurd. Digot; 8’ê Adarê bi rojekê tenê nayê pîrozkirin. Dive jin 364 rojan têbikoşe û roja 365 jî pîroz bike. Jinên Kurd ev peyam girtibûn. Îro jî li her deverê jinên Kurd 364 rojan bênavber û bêsekin ji bo azadiya xwe û Kurdistanê têdikoşin. Û di roja 365’an ango di 8’ê Adarê de dadikevin qadên pîrozbayiyan. Ew ror li qadan dengê jinên azad bilind dibe.